

## 'Elî Baba û Çil Diz

Wextekî li bajarekî Îranê du bira hebûn, navê yekî Kasim, û yê din 'Elî Baba bû. Bavê wan, mîrata xwe ya biçûk di navbera wan herduyan de wekhev parve kiribû. Kasim bi jinekê dewlemend re zevicî, û bû bazirganekî zengîn. 'Elî Baba bi jinekê wekî xwe hêjar re zevicî, debara xwe bi darbirîne dikir û darên dibirî bi sê keran dianî bajêr û difiro.

Rojekî, dema 'Elî Baba li daristanê bû û têra barê kerên xwe dar biribû, dît ku ji dûrahiyan mij û dumanekî mezin nêzîkê wî dibe. Bi baldarî ew nihêrî, û bîstekî de pê derxist ku siyariyek, dibe ku diz be, nêzî dibe. Wî biryar da ku kerên xwe bihêle û xwe xilas bike; hema rapelî li ser darekî mezin yê ku li ser zinarekî bilind hêşîn bûye. Çikilên darê, him têra xefkirina wî stûr bûn û him jî wî dikarî bêyî were dîtin hemû bûyerên li jêr bibîne.

Qefleya ji çil kesên siwarî û biçek pêk dihat, hatin û li ber zinara ku dar li ser hêşîn bûye rawestî û ji hespên xwe peya bûn. Her kesî hespê xwe bêgem kir, bi darekî ve girêda û cuhurê tijî ceh, ê li ser pişta hespê bû, hilawîste stûyê vê. Dû re her yekî xurcê xwe hilda. Xurc ji giranahiya xwe ve ji bo 'Elî Baba wek bi zêr û bi zîvan tijî xuyadikir. Kesek, wek serekê wan xuyadikir, hate di bin dara 'Elî Baba xwe li ser veşartibû de sekinî, û got: "Vebe, Kuncî!" Di nav zinar de derek vebû; û piştî hemû qefle kete hundir, beriya der were girtin, wî jî wan şopand.

Diz, heta demekî di nav zinarê de man. Di vê demê de, 'Elî Baba bi tîrsa girtinê, li ser darê ma.

Di dawî de der dîsan vebû û serek çawa paş hemûyan ketibû hundir, niha jî pêş hemûyan derket derve û li benda derketina hemûyan ma. Dû re bi peyvên "Dade, Kuncî!" re der da girtin. Her kes çû ba hespê xwe û ev gemkir, berika xwe girêda û hespê xwe siyar bû. Serok, dît ku hemû amade bûne, kete pêş wan û ew li riya hatinê de vegeftin çûn.

'Elî Baba bi çavên xwe heta ku ew windabûn wan şopand, û beriya were xwarê demekî dirêj sekinî. Peyvên ku serekê dizan ji bo derî vekirin û girtinê bi kar anîbû bi bîr anî, û daxwaza ceribandina wan kir ku bibîne ka tê derî vebe an na. Lewma di nav bîşeyan de çû û deriyê bi bîşeyan ve hatiye xefkirin dît û li dijî derî sekinî û got, "Vebe, Kuncî". Bi gotina wî re der zûzûka vebû.

'Elî Baba hêviya dîtina şikeftekî tarî û bêhtengî bû, lê belê bi dîtina odekî pir ronahî û fireh re heyirî ma. Ronahî, ji çalekî li ser kevirêkî dihat û ew çal bi her cureyê erzak, baliyên hevrişim, neqş, bestirên nirxdar re û bi kûp û tûrikên seranser tijî zêr, zîv û pere re hatibû tijîkirin. Ji vê dewlemendiyê xuyabû ku ev şikeft zû de ve aliyê wan dizan ve, yê ku di diziyê de serkeftî ne, tê bikaranîn.

'Elî Baba bi wêrekî kete şikeftê, û tûrikên pereyên zêr, qasî dikare bar bike keran, hilda. Piştî tûrik barkire li ser keran, hinek dar jî ku tûrikên wî neyên xuyakirinê li ser tûrikan barkir. Dû re li pêş derî sekinî û peyvên "Dade, Kuncî!" got û derî bixwe hate dadan; û wî di riya xwe ya baş dizanî de çû gundê xwe.

Wextê gihîşte mala xwe, kerên xwe xiste di nav hevşî de, derê hevşî bi baldarî dada, darên li ser tûrikan avêt, tûrik kişande di hundirê malê de, û li pêş jina xwe rêz kir. Dû re wî tûrik vala kirin, çavên jina wî bi dîtina zêran re bel man. Paşê jî ji destpêkê heta dawiyê serpêhatiya xwe ji jina xwe re got, û bi girîngî tembîh kir ku vê tiştê veşêre û kesî re nebêje.

Jinik ji bo vê hebûniyê pir dilşad bû, destpê yek û yek jimartina zêran kir. “Jinik,” gotê ‘Elî Baba, “tu nizanî tu çi dikî, bi jimartinê re ew kar naqede. Ez ê qulekî bikolim û wan çal bikim. Em nikarin xwe egle bikin.” “Tu rast dibêjî, mêrik,” bersîvand wê, “lê bihêle ku em bizanin ka em xwediyê çiqas zêranin. Heta tu bikolî, ez ê pîvanekî bibînim û bipîvim wan.”

Jinik reverev çû mala tiyê xwe Kasim, ê cînarê wan bû, û ji bo demekî kin pîvana wan xwest. Jintî ya wê jî pîvan da wê, lê ji ber ku hejariya ‘Elî Baba dizanî, mereq kir ku ew dê çi bipîvin, û bi xefî pirtiyekî dohn di binê pîvanê ve zeliqand.

Jina ‘Elî Baba çû mala xwe, pîvan bi zêran tijî kir û vala kire li ser doşekê, heta ku ji jimara pîvanê baş tetmîn bû, paşê ew kar qedand, û çû ji mêrê xwe yê ku hema hema kolan diqedand re got. Dema ‘Elî Baba zêr çal dikirin, jina wî jî pîvan paşde bir û da jintî ya xwe, lê qet haya wê ji zêra bi binê pîvanê ve zeliqiyaye re tune bû. “Xwişkê,” got û pîvan dirêjî wê kir, “te dît, min pîvana we çi zû anî. Ez bûm qerdarê te, û ji bo vê spasdariya xwe ji te dikim.”

Bi çûna wê re, jina Kasim binê pîvanê nihêrî û bi dîtina zêrekî re şaşwazî ma. Dexesî di demê de kete dilê wê. “Çi!” got, “‘Elî Baba xwediyê ewqas zêran e ku dipîve? Ji ku hat ew dewlemendî?”

Mêrê wî, Kasim, li dikanê bû. Wextê hate li malê, jina wî gotê: “Kasim, ez dizanim tu xwe dewlemend dibînî, lê ‘Elî Baba zahf zahf ji te dewlemendtir e. Wî perê xwe najimêre, dipîve.” Dû re, wî re ji bo zanîna ku çi dipîvin çi kiriye got, û perê zêr nîşanê wî da. Pere wisa kevn bû ku kesekî nedikarî bibêje ku di demê kîjan mîrê de hatiye bikaranîn.

Kasim, piştî bi jinekî dewlemend re zewicî bû, qet ‘Elî Baba wek bira tevnegeriyabû, û wî îhmal kiribû; û niha, şûna şabûnê, ketibû di nava dexesiya dewlemendbûna birayê xwe de. Heta sibê qet nekariya razê, û beriya hiltana tavê çû mala birayê xwe. “‘Elî Baba,” got, “Te ez şaşmatî kirim; tu wek feqîrên hejar xuya dikî, lê belê zêran dipîvî. Jina min ev zêr li binê pîvana ku we duh bikaranîbû ve dît.”

Bi wan gotinan re, ‘Ali Baba dît ku Kasim û jina wî, ji sedema bêhişiya jina xwe, tişta ku divê xef bikirina dizanin; lê belê tişta bûyî êdî bûye. Ji ber vê bilî şaşwazî an zordarî, wî hemû tişt îtîraf kir û ji bo xef kirina nehêniyê nîveka hebûniya xwe pêşniyarê birayê xwe kir.

Kasim roja din hê nîvşev de hişyar bû, û bi deh hêstirên sindoqên mezin barkirî çû daristanê, û riya ‘Elî Baba wî re gotî şopand. Dil dikir ku wan sindoqan tijî zêr bike. Di demekî kin de gihîşte zinarê, û cihê şikeftê bi alîkariya dar û nîşaneyên birayê wî gotibûn re dît. Wextê gihîşte têketana şikeftê, peyvên “Vebe Kuncî!” got. Derî zûzûka vebû û piştî ew têkete hundir, der hate girtin. Dû hûrnêrîna şikeftê re, dît ku dewlemendiya heyî ji dewlemendiya wî hêvî dikir zêdetir e, gelek kêfxweş bû. Wî bi lezginî tûrikên zêran li ber deriyê şikeftê rêz kirin; lê di hişê wî de tenê dewlemendiya dê bibe xweyî hebû, lewma nekarî ew peyvên ên derî bide vekirin bifikire, û şûna “Kuncî,” gotê, “Vebe, Ceh!” û bi girtî mayîna derî re şaşmatî ma. Wî hinek navên dexlên din ceriband, derî venebû, û çiqas ceriband ku peyva “Kuncî,” bi bîr bîne ewqas hişê wî tevlihev bû, û ev peyv wisa ji bîr kir ku qet ev nebihîstibe. Wî tûrikên piştikirîbû li ser xwe avêtin, û di şikeftê de wek dînan ber bi jêr û bi jor ve meşiya, êdî dewlemendiya li pêş xwe qet nedifikirî.

Nêzîkê nîvro, diz dihatine şikeftê. Dûrve hêstirên Kasim ên beredayî û bi sindoqan barkirî li pêş zinarê dîtin. Lewma qurifîn û bi bayê birûskê hatine li cem şikeftê. Hêstir ajotine di nava daristanê ve û dûr xistin, şûr di destan de nêzî derî bûn û bi peyvên serekê wan re derî zûzûka vebû.

Kasim, dengê lingên hespan bihîst, pê hesiya ku diz hatine û tenê yek tevgerek heye ku wî xilas bike. Wî bi derî ve bezî û dît ku derî vebû, reviya derve û serekê wan palda û erdê xist; lê nekarî ji dizan bireve û wan bi şûran wî kuştin.

Piştî vê bûyerê, dizan pêşî şikeft hûrnêrî kirin. Wan hemû tûrikên Kasim anîbû ber derî û ji bo barkirina hêstiran amadene dîtin û ew paşde kişandine li cihê wan ên berê, lê pê kêmasiyên ‘Elî Baba biribû nehesian. Dû re goftûgo kirin û fikirîn ku çima ew di hundir de bû û çima nedikarî derkeve û bawer nedikirin ku ew çawa wan peyvên nehênî hîmbûye û tenê serî xwe ketiye hundir. Ji bo ku mirovên ê eynî tiştê dê bikin bitirsînin, wan laşê Kasim kirine çar parî û du parî li ser deriyê şikeftê li milê rastê, ên din jî li milê çepê daleqandin. Dû re hespên xwe siyar bûn û dîsa di riya hatinê de çûn ku êrîş bibin li ser karwanên rasthatî.

Di vê demê de, jina Kasim ji ber ku mêrê wê heta êvarê venegeriya, pir diltirsî bibû. Wê biqurifîn beziya mala ‘Elî Baba û got: "Tiyê min, ez bawerim ku tu dizanî Kasim çû daristanê û dizanî çima çû; êdî êvar e, lê wî hê venegeriya ye; ez ditirsim ku tiştê xirab hatibe li serî wî." Piştî nivê şevê ‘Elî Baba bi hersê kerên xwe da rê û çû daristanê. Wextê nêzî zinarê bû, dît ku ne birê wî ne jî hêstirên birê wî xuya nakin, lê bi dîtina hinek xwîn li pêş derî re qurifî û tiştên xirab ketine di dilê wî de; lê dîsa jî ew peyv got û piştî derî vebû, bi dîtina laşê birê xwe yê tengav re pir tirsîya. Têkete di nav şikeftê ku tiştê jî bo laşê birê xwe bibîne; û laş bar kire li ser kerekî û ji bo xefkirinê jî hinek dar li ser laşê de bakir. Herdu kerên din jî bi tûrikên zêran barkir û wek carên pêşî, li ser wan de jî dar barkir; û paşê ferman da derî ku were girtin. Dema gihîşte malê, wî herdu kerên bi zêran barkirî ajote di hevşî de û valakirina wan ji bo jina xwe hişt. Dû re kerê din bire mala jinbira xwe.

Li vir wî, deriyê Mercane vekirbû, pişt xwe de girt û quflkir. Mercane xidamekî pir jîr bû û di rewşên zehmet de çareseriyên kêrhatî didit. Wî piştî ketine hundir, barê kerê vala kir û ji Mercane re got: "Tu divê vê nehênîyê ji tu kesî re nebêjî. Laşê axayê te di nav van herdu selikan de ne. Em divê wî wek bi mirinekî siruştî ve mirîbe çal bikin. Dê here û xanima xwe re bêje. Riya ragihandina mirina wî ji derdor re, ez ji amûrên te yê aqilane û behredar re dihêlim."

Mercane sibê zû çû ba dermanfiroşekî û pirsî dermenekî ku ji bo nexweşiyên pir giran re başe, kir. Dermanfiroş lê pirsî ku kî nexweş e. Wê jî gotê: "Axayê min Kasim nexweş e; û ne dikare bixwe û ne jî dikare bi xive." Mercane êvarê dîsa çû ba eynî dermanfiroşê û bi çavên şil pirsî esanekî ku di demê dawî de didin nexweşan kir. "Baş e!" got, ev ji dermanfiroş hilda, "Ditirsim ku ev derman jî wek ya din ti kêra nexweşiyê neyê û axayê xwe yê baş winda bikim."

Di vê rojê de, ‘Elî Baba û jina xwe heta êvarê di navbera mala xwe û mala Kasim de çûn û hatin. Êdî êvarê tu cînar ji havar û qîrînên jina Kasim û Mercane ên dilêş şaş nema û dengê Mercane ya mirina axayê wê radigihand li hemû cihanê hate bihîstîn. Siba din bi hiltîna tavê re, Mercane çû ba veherînerêkî yê ku sibê zû dikana xwe vedike, bi rojbaş gotinê re silav da wî û zêrek xiste di destê wî de û gotê: "Baba Mustafa, tu divê amûrên xwe yê dirûnê hildî û bi min re werî; lê divê vê bibêjim ku ez ê piştî cihêkî çavên te girê bidim."

Baba Mustafa piştî wan gotinan dudil xuya kir. "Gelo! Gelo!" got û berdewamkir, "tu dê tiştêkî li dijî bawerî an rûmeta min, min bidî kirin?" "Xwedê neke!" got Mercane, û zêrekî din xiste di destê wî de, "Ma ez tiştêkî li dijê rûmeta te ji te dixwazim! tenê bi min re were û qet netirse."

Baba Mustafa bi Mercane re çû, û wê nêzikê mala axayê xwe çavên wî bi desmalekî re girêda û ber bi mala axayê xwe re bir, û piştî têtetine di oda laş tê de ye çavên wî vekir. "Baba Mustafa," gotê, "tu divê bilez van pariyên laşê bi hev re bidûrî, û piştî te karê xwe qedand ez ê zêrekî din bidim te."

Piştî Baba Mustafa karê xwe qedand, wê çavên wî dîsa girêda, wek soz dabûyê zêrekî din jî dayê, û pêşniyara xefkirina vê bûyerê wî kir, heta cihê ku çavên wî cara pêşî girêdabû bir û çavên wî vekir, û wî şande mala wî, lê ji ber tirsê ku tê ew paşde vegere û wê bişopîne, li vir sekinî û heta wî ji ber çavan wînda bû nihêrî. Wê paşê vegeriya malê û hinek av keland ku laşê bişo, û di vê demê de 'Elî Baba laş bixur kir, û ji bo çalkirinê kefen kir. Di demekî kin de, tabût û mele û cem'eta mizgeftê hatina mala wan. Çar cînanan tabût danîn li ser milên xwe û melayê pêşiya wan diçû û dua dikir şopandin ku biçin miriyê çal bikin. 'Elî Baba li paş wan bû, û Mercane di dawiya qefilê bû, şîn digirt, digîriya, singê xwe dida û porê xwe dirûçikand. Jina Kasim li malê ma û bi jinên cînar re şîn digirt û kulamên dilêş digot û digiriya. Cînar jî bi dengê kêr ve bi wê re kilam digotin û digiriyan.

Sê û çar roj piştî şînê, 'Elî Baba hinek eşyayê xwe bire mala jinbira xwe ku êdî li vir bijî; lê pere û zêrên ji dizan bidest xistibû êvarê anî li vir. Dikana kasim jî xiste di bin rêvebirîya kurê xwe yê mezin de.

Dema ew bûyer çêdibûn, ew çil diz hatine serdana şikefta xwe ya di daristanê de ye. Piştî dîtin ku laşê Kasim digel hinek tûrikên zêran hatine birin, şaşmatî man. "Em bi mîsogerî hatine vedîtin," got serek. "Birina laşê û windabûna hinek pereyan nîşan dide ku hevalekî wî mêrika me kuştî heye; û ji bo xatirê canê xwe, divê em wî bibînin. Hun çî dibêjin, kurên min?" Hemû dizan bihevre pêşniyara serekê pejirandin. "Baş e," got serek, "ji we kesekî wêrekitrîn û pir jêhatî divê here li bajar, xwe wek kesekî rêwî û biyanî bide nasîn, biceribîne ka dê tişteki derbarê mêrekî hatiye kuştin de sehbike û lêpîrsîn bike ka ew mêr kiyê û li ku dijî. Ev pir girîng e û ji bo tirsandina ji îxanetê, ew kesê ku dê vê karê bike, heke di karê xwe de serfiraz nebe, an ji xeletiyekî di fikirîna xwe de bike, dê were kuştin."

Bêyî li bendê mayîna hevalên xwe, dizek rabû ser xwe û got: "Ez vê mercê dipejirînim û ji bo hevalên xwe candayîn ji min re rûmetdarî ye." Wî piştî xwe amadekir û berbangî da rê û çû bajarê, û li vir ber bi jêr û jor ve çû û hat heta ku li rastê dikanekî vekirî hat, dikan a Baba Mustafa bû ku wî dikana xwe beriya hemûyan vedikir. Baba Mustafa di destê de şûjin derziyek hebû û dê destpê karê xwe kiriba. Dizê rojbaşî wî kir û dît ku pir pîr e, gotê: "Lo Mamo, tu pir zû destpê karê dikî. Ma kesekî qasî te pîr dikare baş bibîne? Ez dipîrsim, ma ne hewceye ku hinek ronahîr bibe ku tu bikaribî dirûnê bikî."

"Tu min nasnakî," bersivand Baba Mustafa; "ji bo pîrekî wek min, ez xwediyê çavên derasayî me û tu nikarî guman bikî ku heke ez bibêjim ku min pariyên laşekî miriyekî li cihekî li vir tarîtir de bihevre dirûtiye."

"Laşekî Mirî!" diz bi dengê bilind, qêrî. "Erê, erê," bersivand Baba Mustafa, "Ez fêr dikim ku tu dixwazî ez zêdetir bipeyvim, lê tu divê zêdetir nezanî."

Diz fêmkir ku tiştê lê digere dîtiye. Wî zêrek derxist û xiste di destê Baba Mustafa de, û gotê: "Ez daxwaz nakim ku nehêniya te fêr bibim, tu bi vê re dikarî ji min bawer bibî. Tenê ez ji te nîşandana li cihê te laşê mirî dirûtiye dixwazim."

"Heke min ji dil xwestibûya jî," bersivand Baba Mustafa, "min nedikarî vê bînim cî. Ez heta li cihekî çûm, û piştî heta li vê malê çavên min hatin girêdan, û dîsa ji malê heta eynî cihê çav girêdayî vegeyîyam; lewma ne gengaz e ku daxwaza te bînim cî."

"Di be ku," got diz, "tu riya çav girêdayî çûyî, hema biçek jî be, bîni bîra xwe. Were, ez li eynî cihê çavên te girê bidim. Em ê bihevre bimeşin: belkî ev rê hinek were bîra te; û wek hemû kesan tu dê jî heqê vê karê zehmet bistîni, li vir ji bo te zêrekî din heye; daxwaza min bîne cî û min dilxweş bike." Dû gotinê re, zêrekî din xiste di destê wî de.

"Ez nikarim soz bidim," got Baba Mustafa, "ku ez rê tam bi bîr bînim; lê ji ber ku tu dixwazî, ez ê biceribînim." Ji vê gotinê xuyabû ku ji bo dilxweşiya dizê, wî diz bire cihê Mercane çavên wî girêdabûn. "Li vir bû," got Baba Mustafa, "çavên min hatine girêdan; û ez bi vê alî ve çûm." Diz çavên wî bi desmala xwe girêda, û heta li ber mala Kasim, ku êdî 'Elî Baba li vir dijiya, rawestî bihevre meşiyên. Diz, beriya vekirina çavên wî, bi tebeşîra di destê wî de bû nîşaneyek danî li ser derî; û dû re ji Baba Mustafa pirsî ka dizane ev mala kî ye an na; wî jî bersivand ku ji ber ku li vê taxê najî, nikare tiştêkî bibêje. Diz ji bo vê karê zehmet ji wî re spaskir, û wî pašta şande dikana wî, dû re vegeyî daristanê.

Piştî diz û Baba Mustafa dûr ketin, Mercane ji bo karekî ji mala 'Elî Baba derkete derve û çû, lê wextê pašta vegeyîya, nîşaneyê diz danîbû li ser derê dît, sekinî û venêrî. "Wateya vê nîşaneyê çiye?" wê ji xwe re got; "Gelo, kesên xirabîya axayê min dixwazin hene; ew çi dil dîkin bila bikin, divê axayê min ji dijî vê xirabîyê bê parastin." Dû re, wê tebeşîrek hilda û li ser du - sê derên cînan eynî nîşane xêzkir, û ji axa an xanima xwe re tiştêkî negot.

Di vê demê de, diz gihîşte hevalên xwe yê di daristanê de bûn, û ji wan re qala serfiraziya xwe dikir; çawa tenê bi yek kesê re lirasthatiye û wî mirovê agahiya hemû tiştên daxwaz dikir fêr bibe daye wî. Dizan hemûyan bi baldarî guhdariya wî dikirin, dû re serekê wan, pesna serkeftina wî da û got: "Hevrêyê min, demê me ji bo eglebûnê tune ye; divê em xwe baş biçek bikin lê divê kes nezane em kî ne; lewma em ê yek û yek an du kes bihevre herin li bajêr, û li qadekî mezin bîn cem hev. Di vê demê de, ez û hevrêyê me yê ji me re nûçeyên baş anî, biçin li cem malê û biryarekî bidin ku baştirîn ê çi bê kirin."

Ev pêşniyar ji aliyê hemûyan ve hate pejirandin û ew du û du bûn kom û binavber, bêgumana kesekî çûn bajêr. Serek û dizê danê sibê wek sîxur çûbû bajêr mane li dawiyê. Wî serek bire kolana mala 'Elî Baba ya nîşankirî bû tê de ye; û li pêş deriyekî nîşankirî, ku Mercane nîşankirîbû, rawestî. Lê serek dît ku derê li kêlekê jî bi tebeşîr û bi eynî cureyê nîşankirî ye; û ji diza rêber re pirsî ka mal ev deriyê pêşî ye an a din e. Rêber şaşmatî bû, nezanî ku çi bersivê bide, û piştî wî û serekê wî pênc - şeş derên din ên nîşankirî dîtin, hişê wî giş tevlihev bû. Wî sond xwar ku tenê yek der nîşankirîbû û nikare bibêje kî derên din nîşankirîye û nizane ev deriyê cara pêşî li pêş sekinîbû û nîşankirîbû kîjan e.

Serek dît ku plana wan têk çûye, rasterast vegeyî li qada civînê, û hevalên xwe got ku karê wan têk çûye û divê vegeyî şikeftê. Wek hatibûn, wisa paşte vegeyîyan.

Piştî hemû diz gihîştin hev, serek sedema paşte vegeyîyê ji wan re got; û kesa berpirsiyar hate kuştin. Lê ji bo ewlehiya qefila dizan, dîtina kesa duyemîn pêwîst bû, dizekî din xwe da pêş û soz da xwe ku wî dê ji diza din serkeftîtir bibe, û pêşniyara wî hate pejirandin. Wî çû, Baba Mustafa dît û tiştên diza din kiribû dubare kir; û cihê malê fêrbû, û li ser deriyê malê cihekî ne li ber çavan bi tebeşîrekî sor, nîşaneyekî biçûk danî. Demekî kin de, Mercane, ku ti tişt nikare xwe li ber çavên wê xef bike, hat û nîşaneyê sor dît û tiştê cara pêşî kiribû dîsa kir, li ser derên

cînanan eynî nîşaneyê sor, li eynî cihê xêzkir. Wek cara pêşî, wextê diz û serek hatina kolanê, eynî zehmetiya berê dîsa derket pêşiya wan; serek hêrsbû û hişê dizê jî wek diza pêşî tevlihevbû. Lewma bêtetmîniya serek û qefila wî bi têkçûna cara duyem re zêdetir bû; diz jî ku bûye sedema vê xeletiyê, wek diza pêşî hate kuştin.

Serek, ji ber ku du rêhevalên xwe yên wêrek winda kir û tirsîya ku bi vê plana bidestxistina agahiya mala vê kesê diz, zêdetir mirovên xwe winda bike; û ev karê girîng hilda ser xwe. Dû re, wî çû li cem Baba Mustafa, û wî ew xizmeta ji herdu dizên pêşî re kiribû ji wî re jî kir. Wî ti nîşane danenî li ser derî, lê derdor bibaldarî baş venêrî, li ber malê çû û hat ku vê cihê ji bîr neke û ti xeletiyên neke. Ji karê xwe baş tetmîn bû û tiştê kêrî wî were agahdar bû, paşde vegeriya daristanê; û piştî têkete şikeftê ku li vir qefila wî li benda wî bû, got: "Niha, rêhevalên min, ez malê baş nasdikim, ti tiştê êdî nikare riya tolhildana me bigire. Ez li ser planekî ku emê çawa tevbigêrîn fikirîm; heke kesê planekî çêtir fikiriye hebe, em ê guhdariya wî jî bikin." Dû re wî plana xwe ji wan re got; û plan hate pejirandin, û diz şande gundan ku nozdeh hêstir bi sî û heşt kûpên biçerm, yek bi rûn tijî û ên din vala bikirin. Di navbera du û sê rojan de dizan hêstir û kûpên mezin kirîn, û ji ber ku devê kûpan ji bo armanca wan pir teng bû, serek devê wan kûpan da firehkirin; û her mirovek bi çekên xwe têketin nav kûpekî û ku mirovên di hundirê kûpê de bikaribin bêhna xwe hildin, şûna dirûtinê, devgirê kûpan bi rûnê hatin pêgirtinê.

Piştî nozdeh kûpên diz tê de û kûpekî rûnê ji hêstiran hate barkirin, serekê xwe da pêş wan û ber êvarkî gihîştin bajêr. Bi hêstiran re kete di nav kolanên de heta gihîşte li ber mala 'Elî Baba ku wî jî li pêş derî rûniştibû ku piştî şîvê hinek hewa hilde. Wî hêstirên xwe da sekinandin, û xwe da nasîn, got: "Min hinek rûnê pir delal aniye ku sibê li bazarê bifiroşim; û niha şev derengiye û ti rawestegehên nas nakim. Heke ji we re nebim bar, min re xêrekî bikin ku ez îşev li mala we bimînim."

Ji ber ku 'Elî Baba serekê dizan li daristanê dîtibû û dengê wî bihîstibû, qet texmîn nekir ku ew bazirgan serekê wan dizan be. Wî bi xêr hatin gotê û derê hevşê ji bo hêstirên wî vekir. Gazî xulamekî xwe kir û ferman dayê ku piştî valakirina barê, hêstiran têxe govê û debar bide wan; çû bibêje Mercane ku ji bo mêvan şîvê amade bike. Piştî xwarina şîvê, 'Elî Baba dîsa gazî Mercane kir, şîreta baş xweyîkirina mêvanê ji wê kir û gotê: "Sibê, beriya hiltana tavê, ez ê serê xwe bişom; kirasên min bide 'Ewdila û wextê ez vegeyriyam li malê bila şorbekî xweş amade be." Dû re çû razê.

Di vê demê de serek jî çû li govê, devgira her kûpê vekir û ji wan re tiştên ê bikin got. Ji kûpa pêşîn destpêkir û heta ya dawiyê, ji hemûyan re got: "Ez çawa ji paceya oda ez ê razêm kevîran bavêjim, ji kûpên xwe derkevin derve û ez ê beşdarê we bibim." Dû re vegeyriya li malê, Mercane ji wî re çirayek anî û oda wî nîşanî wî da.

Mercane, ku daxwaza 'Elî Baba hate bîra wê, çû kirasên wî amade bike û ji 'Ewdila re bibêje ku quşxanê ji bo şorbê amade bike; lê di vê demê de rûnê çiraya wê xilas bû û temirî, û li malê ti rûn nemabû. Wê jî amana rûnê hilda û çû govê; wextê nêzî kûpa rûnê ya pêşîn bû, dizê bi dengê kin jê re got, "Gelo, wext hat?" Bêyî nîşandana şaşmatiyê, wê bersivand, "Niha na, bîstek din." Bi vê şeklê çû ba hemû kûpan û ji hemûyan re eynî bersiv da, dawî de gihîşte kûpa rûnê.

Êdî Mercane fêhm kir ku axayê wê 'Elî Baba, sî û heşt diz rakiriye li malê û ew kesê ku xwe wek bazirganê rûnê daye nasîn jî serekê wan dizan e. Wê amana xwe tijî rûn kir û vegeyriya pêjgehê, çiraya xwe vexist, quşxaneyekî mezin hilda û dîsa çû ba kûpa bi rûn tijî, quşxana

xwe tijî kir, bir û danî li ser agir û rûn qijiland, dû re rûnê qijilandî bire govê û li ser her kûpekî de têra kuştina mirovekî rûn rijand. Piştî karê xwe qedand, vegeriya pêjgehê; şorbek danî li ser agira pê rûn qijilandibû, çira vemirand, lê neçû razanê û bêdeng ji paceya pêjgehê de gov nihêrî û li bendê ma ka dê çi bibe. Zêde li bendê nema, ji ber ku serekê dizan hişyar bû, paceya odê vekir, û tu çira nedît, tu deng an livînê nehesiya, ku nîşaneyê bide dizan, kevir avête kûpan. Dû re guhdariya wan kir, lê ne deng bihîst ne jî tu livîn dît, hêrsbû û cara duyem kevir avêt, dîsa tiştê nedît û cara sêyem kevir avêt û qet sedema vê fêhm nekir ku çima yek ji wan bersîv neda nîşaneyê wî. Hêrsbûyî, bêdeng çû govê, û çû li cem kûpa pêşîn, qey digot diz sax e û razayî ye, devê xwe vekir ku jê bipirse, bîna rûnê qijilandî bêhnkir û hilma li ser kûpan radibû dît. Êdî wî gumandar bû ku plana wî ya kuştina 'Elî Baba û talankirina mala wî derketiye holê. Hemû kûp yek û yek venêrî û dît ku hemû rêbirên wî mirine; û ji têkçûna plana xwe re hêrsbûyî, xwe derê govê da û derî vekir, derkete di nav baxçê û hilkişiya li ser diwarê ku bireve.

Piştî Mercane revîna wî dît, çû nav nivîne xwe, û dilxweş bû ku jiyana axayê xwe û malbatî wî rizgar kiriye.

'Elî Baba berbangî sibê bi xulamekî xwe re hate malê û bêyî haya bûyerên şevê din li mala wî qewimîne, çû serşokê ku serî xwe bişo. Piştî derket, bi dîtina neçûna bazirgan û hêstirên wî re şaş ma û sedema vê jî Mercane pirsî. "Axayê min," bersivand wî, "Xwedê te û malbata te parizî. Tu dê sedema vê, heke bi min re werî û dema tu tiştên ez ê bidim nîşanê te bibînî, baş fêhm bikî." Dû re wê bire li cem kûpa pêşîn û pirsî ka qet di kûpê de rûn dibîne an na. 'Elî Baba kûp nihêrî û mêrek dît û bitirs paşde çû û qêrî, "Ne tirse," got Mercane, "ev mêra tu dibînî ne dikare zirarê bide ne jî yekî din. Wî mirî ye." "Êê, Mercane," got 'Elî Baba, "ev çi bû te nîşanê min de?" "Şaşwaziya xwe kontrol bike," bersivand Mercane, "û mereqa cînarên me neyîne li ser me; xefkirina vê nehênîyî pir girîng e. Ew kûpên din jî binêre."

'Elî Baba kûpên din jî yek bi yek venêrî; û wextê hate li cem kûpa rûnê, dît ku nivîyê zêdetir vala bûye, û li vir bêtevger rawestî, bêyî tiştê bibêje, şaşmatî caran kûp û caran jî Mercane nihêrî. Mercane, dû re wî re tiştên kirî, ji nîşaneyên li ser derê malê dîtî destpê kir, û heta kuştina dizan û revîna serekê, vegot.

Bi bihîstina wan kiryarên wêrek ji devê Mercane re, 'Elî Baba gote wê: "Xwedê, bi gotina te, min ji dafika dizan ku ji bo kuştina min amade kiribûn xilaskirî ye. Ez jiya xwe kerdarê te me; û ji bo spasdarî, diyariya min a pêşîn ev e ku niha vê demê te azad dikim, heta ku ez diyariya tu heq dikî bidim te."

Baxçê 'Elî Baba gelek mezin bû û li serî jora baxçê darên mezin hebûn. Li nêzikê wan daran wî û xulamê wî 'Ewdila kûrekî mezin kolan û têra hemû laşên dizan fireh kirin; û hê derdor ronahî nebûyî destpê çalkirinê kirin. Piştî qedandina vê karê, 'Elî Baba kûp û çekên dizan veşart; û ji ber ku ji bo hêstiran cihê wî tunebû, di demên cuda de, ew bi xulamê xwe re şande bazarê û firotin.

Serek jî êdî vegeriya bû daristanê û hêsekî nedîtî wî girtibû. Wî li vir zêde nema; tenêbûna li şikefta bêhtengî êdî wî ditirsand. Wî biryar da ku tola rêhevalên xwe bi kuştina 'Elî Baba re hilde. Ji bo vê armancê, wî vegeriya bajêr, û li xanekî bicî bû, û xwe wek bazirganê hewrîşim da nasîn. Ku wî bawer bikin, wî jî şikefta xwe bi cureyan tiştên dewlemendan û kirasên baş anî xanê, demê çûn û hatina şikeftê de tedbirên xwe hildida ku şikeftê kişf nebe. Ji bo bazirganiyê, wî dikanek girt û tiştên xwe anî li vir; dikan li dijî dikana Kasim bû û kurê 'Elî Baba jî piştî mirina mamê xwe ve li ber vê dikanê bû.

Wî navê xwe kire Xoce Hoseyn, û wek nûhatiyekî, bi gorê kevneşopiyan, çû serdana hemû bazirganên cînar. Kurê ‘Elî Baba, di derdorê de kesê yekemîn bû ku bi Xoce Hoseyn re axivî, û bû heval. Du an sê roj piştî bicî bûnê, ‘Elî Baba hate dîtina kurê xwe, û serekê dizan ew naskir û paşê ji kurê wî hîmbû ku ew kî ye. Piştî vê, wî êdî bi baldarî wî re hevaltî dikir, wî re baştirîn tevdigeriya, diyariyên biçûk dida wî û pir caran wî gazî taştî û şîvê dikir.

Rojekî kurê ‘Elî Baba û Xoce Hoseyn bihev re meşiyên û çûne geranê, û dema veşeriyên, kurê ‘Elî Baba, Xoce Hoseyn bi aliyê kolana ku mala bavê wî tê de ye bir, û wextê gihîştin malê, rawestî û wî derî da. "Ev e," got, "mala bavê min e, ku min ji wî re qala te kirîye, rûmetdariya nasîna xwe pêşkêşê wî bike; û ez dixwazim vê dilxweşiyê jî bidanim li cem dilxweşiyên din ên te dane min."

Çiqas yekane armanca Xoce Hoseyn ev be ku bikeve hundirê malê û ‘Elî Baba bikuje be jî, lêborîna xwe xwest ku biçê; xulamêkî derî vekir û kurê ‘Elî Baba destê wî girt û bihev re têtetin hundir. ‘Elî Baba rûken û nazîkane Xoce Hoseyn pêşwazî kir. Wî ji bo hevaltiya wî ya bi kurê xwe re spasdariya xwe anî ziman; û lê zêdekir ku kurê wî hê pir ciwan e û hê dinyayê baş nasnake, parvekirina agahiyên xwe minetdariyekî mezintir dide wan. Piştî hinek hevpeyvînê, wî daxwaza çûna xwe kir, lê ‘Elî Baba wî da sekinandin û gotê: "Gelo, tu wiha bilez diçî ku? Ez li ber te digirim ku bi xwarina şîvê me rûmetdar bike; çiqas ziyafeta me ne gorê te jî be, ez ji dil vê daxwazê dikim." "Axayê min," bersivand Xoce Hoseyn, "ez dil dikim ku daxwaza te ya baş bînim cî; lê ez nikarim ti xwarinên bixwê bixwûm; lewma bifikire li ser sifrê ez ê çi halê de bim." "Heke yekane sedem ev be," got ‘Elî Baba, "ev rûmeta beşdarbûna te asteng nake; ji ber ku di nav nanê me de qet xwê tune ye, û ji bo xwarina me ya îşev jî soz didim ku qet xwê tê tune be. Lewma ji me re başbûnekî bike û bimîne."

Dû re ‘Elî Baba çû pêjgehê û Mercane re got ku îşev bila di goşt de xwê tune be; û zûka du-sê firakan xwarin amade bike, lê bila ew jî bêxwê bin. Mercane ku herdem ji bo fermanên axayê xwe amade bû, vê carê hinek şaşmatî ma. "Ew mêra ecêb û xerîb kî ye," got, "kî goşt û xwarinê bêxwê dixwe? Heke ez xwê ji we dûr bigirim, wê şîva we berbat be." "Hêrs nebe, Mercane." bersivand ‘Elî Baba, "Wî mirovekî camêr e; lewma tiştên min te re gotî bîne cî." Mercane bêyî bêdilî bike, gotinê wî anî cî, û mereqa vî mêra qet xwê naxwe kir. Piştî qedandina karê li pêjgehê, ji bo amadekirina sifrê, wê alîkariya ‘Ewdila kir; û çawa çavên wê Xoce Hoseyn ketin, çiqas xwe xef kirî be jî, naskir ku wî serekî dizan e, û bi venêrînekî bibaldarî dît ku di bin kincên wî de xencerek heye. "Ez qet ne behitîm," wê bi xwe re got, "ku ev mêra bêexlak û dijminê axayê min ê mezintirîn, bi axayê min re xwê naxwe, ji ber ku dil dike ku wî bikuje; lê ez ê nahêlim ku ev tişt bibe."

Wextê ‘Ewdila fêkî û mey anî û danî li pêş ‘Elî Baba, Mercane jî kincê reqsê yên delal li xwe kir, şalpek danî li serê xwe, cilekî bi zîv nexşekirî li dora zikê xwe aland û xencerek di bin de cî kir û rûyê xwe bi peçeyekê girt. Piştî amadebû, ji ‘Ewdila re got: "Defika xwe hilde, û em biçin dilê axayê xwe û hevalê kurê wî xweş bikin. Çawa em caran dilê axa xweş dikin, em ê wisa bikin."

‘Ewdila defika xwe hilda, kete pêş Mercane û di holê de destpê lêdanê kir û wextê Mercane hate li ber derê odê, bi xurmet serê xwe berjêr kir û li benda destûrê ma. "Were Mercane," got ‘Elî Baba, "were bila Xoce Hoseyn bibîne ku tu dikarî çi bikî, û derbarê rapêşîya te de fikra xwe bibêje."

Piştî reqsên rêzdarî, wê destpê reqsa xwe kir, xencera xwe ji bin cilê xwe kêşa û di destên xwe de girt, bi xencerê destpê reqsa xwe ya rastî kir, bi tevgerên sivik livî, û wek jinên reqase reqs



kir. Wê, caran xencer dibir li ser singê xwe yê rastê, caran jî yê çepê, û wisa dida xuyakirin ku xwe dide ber xenceran. Di dawî de, wê def bi destê xwe yê çepê ji 'Ewdila stend, û xencer jî bi destê xwe yê rastî girt, def zivirand û wek sênîyekî girt, reqsa xwe domand û ji temaşevanan daxwazkir ku comerdiya xwe nîşan bidin.

'Elî Baba zêrek danî li ser defê, kurê wî jî wisa kir; û Xoce Hoseyn, dît ku wê nêzî wî dibe, peredanka xwe ji singê xwe derxist ku jê pere hilde; lê belê wextê wî destê xwe xiste di peredankê de, Mercane xencerek li ser dilê wî da.

'Elî Baba û kurê wî, bi şaşwazî û bi dengê bilind qêriyan. "Jina bêmeymenet!" qêrî 'Elî Baba, "tu çi diki ku min û malbata min mehf bikî?" "Ev parastin bû, ne mehfkirin," bersivand Mercane; "vê binêre," wê berdewamkir, kincê Xoce Hoseyn hinek ji hev vekir û xencera wî nîşanê wan da, "te ziyafet dida dijminekî xwe! Wî baş venêre, û tu dê pê derbixî ku wî him bazirganê rûnê ye û him jî serekê wan çil dizan e. Bi bîr bîne ku wî bi te re qet xwê nexwar; û êdî çi ma ku tu ji plana wî ya bêexlak bawer nakî? Beriya dîtana wî, ez biguman bûm, wextê te min re got ku mêvanekî me yê wisa heye. Ez wî nasdikim, û niha te dît ku gumanbariya min ne bêerd e."

Dû re 'Elî Baba dît ku Mercane cara duyem e wî ji mirinê xelas dike, wê hembêz kir. "Mercane," wî got, "min te azad kiribû, û dû re soz dabû te ku spasdariya min bi vê re xilas nabe, lê niha tu dê bibînî ku ez çiqas ji dil û can vê dibêjim; niha pê ve êdî tu bûka minî." Dû re kurê xwe nihêrî û gotê: "Ez bawer dikim ku kurê min, tu yekî wisa rêzgirî ku Mercane ji xwe re wek jin bipejirînî. Tu dibînî ku Xoce Hoseyn bi te re bû heval û mamoste ku bikaribe bi rehetî min bikuje; û bêguman wî dê te jî ji bo tol hildana xwe bikuşt. Bi fikire ku bi zewaca bi Mercane re, tu bi parêzgerê malbata me re dizewicî."

Çend rojek dû re, 'Elî Baba bi şahîyekî mezin, daweta kurê xwe û Mercane kir, govend hatin girtin û merasîmekî mezin hate nîşandan; û wî bi dîtina hemû heval û cînarên xwe yên vexwendî dilşad bû. Ê dizanî ku ew rastiya vê zewacê nizanin û ew Mercane nasnakin û hunerên wê yên comerdî û başiyên di dilê wê de nizanin.

'Elî Baba heta salekî neçû şikefta dizan, ji ber ku wî guman dikir ku li gorê hisaba wî hê du diz dijîn û li vir bin. Piştî sala wî tamam bû, wî dît ku kes nerihetî nade wî, biryar da ku here şikeftê. Wî hespê xwe siwarbû û wextê gihîşte şikeftê ji hespê xwe peya bû, hespê xwe bi darekî ve girêda, dû re nêzîkê têketina şikeftê bû, ew peyv got, "Vebe, Kuncî!" û der vebû. Wî têkete şikeftê, û bi dîtina tiştên li vir, wî zanî ku kesek ji xeynî serekê wan, ku ji bo dikana xwe hinek tiştên firotinê biribû, nehatiye li vir. Edî wî bawerkir ku di vê dinê de ji xeynî wî kesek xwediyê agahiya derî vekirina şikeftê nîne, û ew hemû dewlemandî û xezîne tenê ya wî ye. Wî têra ku hespê wî bardibe zêr xiste di tûrikan de û vegeriya bajêr. Piştî çend salan, wî kurê xwe bire şikeftê û nehênîya xwe fêrê wî kir, ew nehênîya ku têra hemû zuriyeta wî dikir û wan ew dewlemendî bibaldarî bi kar anîn, herdem birûmet jiyana xwe domandin ku heta tunekerê dilşadiyan û veqetînerê hevalan hate serdana wan.

Werger: Jarocan

(Ji Îngilîziyê hatiye wergerandin.)